# Sîstema her tim terorîst

Piştî şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» niha dezgehên evlekarîyê yên rejîmê rêkûpêktir bihev re kar dikin ku bikarin motîvasyona endamên sazî û grûpên opozisyonê dabezînin û fersenda çalakiyan li wan bistînin.

dom»R:4




*Bidestveanîna mafên netewî yên gelê kurd di çarçoveya Îraneke demokratîk û federal de*

# Agirî

Duheftînameyek Siayasî-Giştî Ye, PDK Îranê diweşîne www.kurdistanmedia.com/kurdî
www.agirimedia.org Hejmar (470) 21-05-2024 Buha (1000) Tûmen

# Nezanî valahîya herî mezine di navcîhana mirov de

Ecêbekî mirov jî ewe ku mereqdare û birçîyê hînbûnê ye. Lê hêlekî ecêb ya mirov a din jî ewe ku çi tewir riya hînbûnê a hêsan hebe wî dipejirîne. Di pedegojîya rojhelata navîn de rêbaza pedegojîyê ya ramîndar nîne. Ev bi zanetî û bi pîlan hatîye pejirandin. Di şûna vîya de paketên safî û amade hatine pejirandin.
Ger caîz be wek xwarina amade tê pêşkêşkirin.


dom» R:9

# Îran dibêje dibe ku êdî ew bombeya etomî bixwazin!

Di rojên derbasbûyî de Kemal Xerazî şêwirmendê Elî Xamineyî û herwisa hin berpirsên bilind ên rêjîma Îranê ragihandin ku heke Rojava û Îsraîl siyasetên xwe neguherin, dibe ku Îran êdî bixwaze bombeya etomî berhem bîne.
Piştre Josef Borel berpirsê siyasetên derve a Yekîtiya Ewropa ji Îranê xwast dev ji vî karî berde.Hin siyasetvanên Ewropî dibêjin Borel hertim li hemberî Îranê nerim bûye û pêwîst e bihêztir be.

dom» R:7

# Mirina cinayetkarekî rêjîmê bû sedema keyxweşiya hejmareke zêde ji xelkê



Îbrahîm Reîsê, yê serkomarê rêjîmê tevî pêşîneyeke reş li kuştina hezaran girtiyên siyasî li sala 1367 a Rojî û bidarvekirin, kuştina ser şeqaman û îşkencekirina xelkê Îranê, roleke bingehîn hebûye.
Li halekê de ku hejmarek ji milîsên ser bi rêjîma Îranê ên wek Hemas û Hizbullah û Hûsiyên Yemenê li derheq mirina Îbrahîm Resî peyama sersaxiyê bo rêjîmê şandine, hejmarke zêde ji xelkê Îranê bi belavkirina şêrînî li ser şeqaman, nivîsîn û belavkirina peyaman li ser torên civakî, keyfxweşiya xwe ji mirina wî cinayetkarê rêjîmê ade xuya.

Li halekê de ku polîsê rêjîmê huşdarî daye ku bikarhênerên torên civakî xwe ji nivîs û wêneyên ku nûşanderî keyfxweşiya xelkê ye biparêz in, sîpelek ji peyam, wêne û henekên xelkê bi rîêjîmê û herwisa keyfxwşiya xelkê ji mirîna wî cinayetkarî, tê dîtin.
Beşek ji malbatên qurbaniyên şoreşa Jînayê, malbatên bidarvekiriyan û beşeke ji xelkê xisarpêketî û qurbaniyên cinayetên vê rêjîmê îşare dikin ku hewcebû ew cinayetkare, berî mirinê ji aliyê xelkê ve hatiba dadgehîkirin.

Îbrahîm Reîsî tevî wan cinayetên hovane, bû sedema gelek pirsgirên din li Îranê yên wek pirsgirêkên aborî û civakî û herwisa wek serkomarên berê yên rêjîmê bi sozên çewt cehda xapandin û jirêderxistina xelkê Îranê dida û fermanên rêberê rêjîma Îranê li hemû waran bi taybet, serkut, kuştin, sizadan û bidarcvekirina xwenîşanderên nerazî û serhildêran, cî bi cî dikir.



# Zimanê Kurdî hebûna miletê kurd e

Bi hilkevta 15ê Gulanê ku gerçi bi avayekî fermi wek roja zimanê Kurdî nehatiye naskirin û ev roj nefermî ji aliyê gelek ji Kurdan ve ev çend sale tê pîrozkirin.
Ji bo lêxwedîderketina zimanê kurdî, berîya her tiştî divê em bi kurdî biaxivin, em kurdî fêr bibin. Celadet Bedirxan û hevalên xwe di 15ê Gulana 1932an da hejmara yekem a Kovara HAWARê derxistin û heta 1943yan 57 hejmarê govara HAWARê hatne çap û belavkirin.


dom» R:6



# Reîsî û eger û pirsyarên sinaryoyêta roja cîhanî a Kirêkar

Reîsî 8 emîn serkomarê rêjîma Îranê, tevî Husêyn Emîr Ebdulahiyanê wezîrê derve yê rêjîmê, Seyîd Mihemded Elî Alê Haşim nûnerê Xamineyî li Tewrêzê û Malik Rehmetî parêzgarê Tewrêzê digel 4 kesên din ên piledar û pîlotên Hilîkoptêrê, roja 30 Banemerê piştî beşdarî kirin li wekirina pirojeyekî bendav çêkirina li ser sinûrê di navbera Îran û Komara Azerbaycanê, li bûyereke kevtina xwarêye Hilîkoptêrê de li devera Werzîqanê hatne Kuştin, û li ber hegera asêbûna cihê kevtina Hîlkoptêrê û rewşa xirabe Av û Hewa, piştî nêzî rojekê bi alîkarî wergirtin ji pehpadên Turkiyê, Laşê Hîlkoptêrê û termê Reîsî û hevalên wî hate peydakirin.

dom» R:2



# Şaneder, serçaveya têgihîştineke nû ya cîhanê ji "Neanderthal"an

Kurdistan yek ji kevnartirîn cihên cîhanê ye û li kîjan warî ve mêzeyî cografiya û dîroka vê bikin, gelek mijarên xwedî nav û deng û cihê heyrîmanê dibînin. Lêmixabin bi sedema vê yekê ku em ê Kurd xwdiyê kiyaneke serbixwe nînin û xwdiyê damezraveyên pêşkevtî yên hikûmî nînin, lêkolînên hûr li ser naehatine kirin.

dom» R:10

# Reîsî û eger û pirsyarên sinaryoyê



N. Nûredîn Sofîzade



Reîsî 8 emîn serkomarê rêjîma Îranê, tevî Husêyn Emîr Ebdulahiyanê wezîrê derve yê rêjîmê, Seyîd Mihemded Elî Alê Haşim nûnerê Xamineyî li Tewrêzê û Malik Rehmetî parêzgarê Tewrêzê digel 4 kesên din ên piledar û pîlotên Hilîkoptêrê, roja 30 Banemerê piştî beşdarî kirin li wekirina pirojeyekî bendav çêkirina li ser sinûrê di navbera Îran û Komara Azerbaycanê, li bûyereke kevtina xwarêye Hilîkoptêrê de li devera Werzîqanê hatne Kuştin, û li ber hegera asêbûna cihê kevtina Hiîkoptêrê û rewşa xirabe Av û Hewa, piştî nêzî rojekê bi alîkarî wergirtin ji pehpadên Turkiyê, Laşê Hiîkoptêrê û termê Reîsî û hevalên wî hate peydakirin.

**Reîsî kê bû?**

Seyîd Îbrahîm Reîsî sala 1339 li Meşhedê ji dayîk bû, Heya pola 6ê xwend û piştre ço hewza îlmiyê bo xwendina olî, piştî şorişa gelên Îranê û hatina serkare rêjîma dîktatore komara îslamî, Reîsî li temenê 20 saliyê de weke axundekî tundajo weke dadistanê Kerecê hate diyarîkirin.

Piştî heyamekê karkirin li Hemedanê, sala 1364ê ji aliyê Mihemed Yezdî serokê dezgeha Qezayî a rêjîmê ve, reîsî weke Dadistanê giştiyê Têhranê hate diyarîkirin.

Li cinayet û komkujiya girtiyên siyasî li sala 1367ê de, reîsî endamê heyeta merg bû û hikmê êdama hezaran girtiyan der kir.

Heyamekê serokê saziya çavedêriya giştiye welat bû, sala 1383 heya 93ê cêgirê serokê dezgeha qezayî bû, piştre heya sala 94ê dadistanê giştiye welat bû.

Piştre ji aliyê Elî Xamineyî ve weke serokê Astanê Qudsa Rezewî hate diyarîkirin heta sala 1400 reîsî wek berbijêr û li rastî de bê rikeberê posta serkomariya rêjîmê û kesê cihê hitbar û pejirandina Xamineyî, bi rêjeyekî gelek kême dengan, weke serkoma serî li sindûqan de îna derê.

Reîsî endamê herdûk organên rêjîmê yên meclisa Xêbrigana rêberî û kora berhevdana berjevendiyên rêjîmê bû, hevdem endamê dadigeha taybet bi rûhaniyetê jî bû.

Reîsî bi sedema desthebûn li kuştara bikome girtiyên siyasî û tepeseriya azadîxwazan û xelkê Îranê, ji aliyê rêkxistinên cîhanî û welatê Amerîka ve, bi cinayet dijî mirovahiyê hatibû sûçdarkirin.

Gerçî mirna cinayetkarekî dilreşe weke Reîsî û bikuj û biryarderê kuştara Hezaran kes ji baştirîn xortên welat û cinayet bi dijî mirovahiyê, ev ji roja dadigeha gel xelas kir, tenê em dikarin wê şadî û keyfxweşiya xelkê û malbatên qurbaniyan, wek xaleke mînak bibînin ku divê bo hemî cinayetkar û mirovkuj û tepeserkaran re bibe dersa ibretê.

Her digel belavbûna nûçeya kevtinexwarê û bêşerşûnbûna Hilikuptêra Reîsî, li piraniya bajarên Îranê de xelkê keyfxweşiya xwe derbirîn û bi agirbazî û belavkirina şîrniyan û dadana postên keyfxweşiyê li ser torên civakî, me dît ku xelkê welat, dehan hezar malbatên dilbirîndar yên qurbaniyên destê Reîsî û rêjîma komara Îslamî, heya çi qasekê dil tejî û vêzar û bi kînin ji wê rêjîmê û deshilatdarên wê.




Hekî ne, di nava sîstema rêjîma Îranê de reîsî tenê amil û bikerê afirandina cinayetan bû û mohreyekî pûç û betal zêdetir tiştek nebû, û bi mirn û ji navçona wî jî renge çi tiştek neyête giherîn û îstiratêjî û siyaset û îdolojiya paremayî a rêjîmê hekî xirabtir nebe, baştir jî nabe.

Di nava wê sîstema dîktator de hezaran cinayetkarên dinê ye wekî Reîsî henê û Xamineyî kê hezket dikare danê cihê wî.

Gorî yasaya rêjîmê, Hekî serkomar nemîne, heya 50 rojî şêwra hevpar pêkhatî ji serokê dezgehên qezayî û Meclisê û cêgirê serkomar, erkdarin ku li jêr çavedêriya Elî Xamineyî de karê wî encam bidin û kesekê bo cihê wî diyarî bikin.

Lê ev bas û gotinên çêkirina gumana li ser ji navçona Reîsî têne kirin û weke pirsyar derdikevin, kê û kengê dê bersiva wan bête danê, gelek rohne ku dê herwisa lêl bimîne.

Di dîroka deshilata rêjîma komara Îslamî de şerê jinav birin û hezfa hevdu de gelek mînak û belge hene.

Tîqîn û kuştina Serkomar û Serokwezîr, anku recayî û Bahuner, heya îro rojê jî nekarî vê gumana hezfa nava deshilatdaran biverewîne.

Kuştina Bihştî, Muteherî, Destxeyb, û gelek deshilatdarên dinê ji aliyê tunajo û têniyê deshilatê, nihajî bal xelkê bê bersiv mane, Xistina xwerê ye Firoke û Hilêkoptêrên dehan Fermandên artêşê û Sipahê bi sinaryoyên tesadufî, û gelek mînakên dinê, ji pîlanên herî berçave rêjîmê bûne.

Lewra digel belav bûna nûçeya kevtina xwarê ye Hilêkoptêra reîsî, hemî ev pirsyarane bal xelkê çêbûn ku erê gelo, tu bêjî teswiya navxwe nebe? Tu bêjî Muctebayê kurê Xamineyî ku niha çavê wî li kursiyê rêberiya babê wiye û reîsî weke rikeberê xwe didît, pîlana ji nav birina reîsî nedanabe?

Erê gelo tu bêjî Xamineyî hebxwe ji kar û kiryarên Reîsî têr û bêzar nebibe û okêya çêkirina wê bûyerê nedabe?

Erê gelo tu bêjî Îsraîl di nava axa Îranê de lênedabe ku heya niha mînak zafin li kuştina zanayên rêjîmê û girtina sîxuran û dizîn û birina bi Tonan perwendên Etomî de?

Bê guman ti carî xelk nagîje bersiva wan pirsyaran, û renge bi kuştin û hezfa kesekî weke Reîsî jî çi tiştekî taybet neqewime.

Ewa bal min girîng ewaye ku xelkê welat çiqas bi kuştin û ji navçona cinayetkaran keyfxweşin û di demekê de ku rêjî taziya giştî radigehîne, seranserî welat tereqebazî, şadî û şirnî belavkirin û keyfxweşiye.

# Şer ji bo şer



**N. Kerîm Perwîzî**
**W. Hesen Mukerem**



Di gotin û dîtinên lêkolîner û hizrmendên siyaset û ramana siyasî de, dibêjin siyaset berdewamiya şer e, Bi gotineke din, heta ku hêza fizîkî, agir û şiyana kuştina yê din bi zelalî xuya bibe, şer berdewam dike û piştre qonaxek dest pê dike ku pîvanên şer ber bi hevkarî, lihevkirin, danûstandin û sepandina şert û mercan bi ser hevdu û berkevtiyan ve diçe.

Siyaset, ji vê perspektîfê, pêngava di dilê şer de ye ku bi têgihiştina piştî şer û nihêrîna li paşerojê, hewl dide rêveberiyeke din ava bike û di navbera aliyên şer de têkoşîna desthilatdariyê ji bo bidestxistina encamên tê xwestin.

**Ev çend roj in ku şerê navbera Îsraîl û Hemasê didome û alîgirên Îsraîlî piştgiriya wê dikin, rexne jî dikin û givaşan lê dikin, di heman demê de Xamineyî û çeteyên wî piştgiriya Hemasê dikin û hêvî dikin ku şer û alozî berdewam be, û hêdî hêdî dîmenek dûr derdikeve ku piştî şerê 7ê Cotmehê çi bê kirin?**

Wezîrê Berevaniyê yê Îsraîlê ku di destpêka şer de li gel Netanyahu kabîneya koalîsyonê ava kir, got ku divê bernameyeke piştî şer hebe.

Digel vê yekê jî serfermandarê artêşê her liderheq vê yekê tiştek gotiye.

Eva di demekê de ye, ku hîn qonaxên şer berdewam in, heta niha çarenivîsa wan kesên ku ji aliyê Hemasê ve di kiryareke terorîstî de hatine revandin, ne diyar e û baregeha Hemasê jî li Refehê maye, Ev nîşan dide ku rast di dilê şer de, dema çek dişewitin û bombe dişewitin

**divê aliyên şer li ser vemirandina agir bifikirin û roja piştî şer, Diyar e piştî şer êdî ne cîhana şer û ne jî cîhana beriya 7ê Cotmehê heye!**

Ger em bi lêkolineke bilez û hinekî kûr li bûyerên cîhanê û derdora xwe binerin, gelek ezmûn û serpêhatî ji me re dibêjn ku bi dana berhev a rewşa welatekî wek Îranê gelek cudahiyan nîşanî me didin!

Rastî, ne hewce ye ku em bibin xwendekarên doktorayê li zanîngehên bi prestîj, da ku fêm bikin ku siyaset berdewamiya şer e, lê bi çek û taktîkên cûda.

Bi xwendina nûçeyeke wisa ku hinek berpirsên hinek welatan dibêjin, jixwe bernameya me ya roja piştî şer heye, em hest dikin ku ev şer heta dawiya dinyayê û heta hetayê namîne!

Ji nişka ve ev yeka ji bo me çê dibe ku divê em di nava şerê mûşekî, bombe û roketan de li paşeroja gel û welat bifikirin!

Di heman demê de, ew ji me re vê dibêje ku şer, bê xwestin an nexwazî, wekî kiryarek heywanan ku tenê armanca wan kuştina hev e, nebînin! Sedema vî şerî çi dibe bila bibe, divê em vê jî bizanibin ku civakek mirovî heye ku divê em li ser birêvebirin û peydakirina derfetên jiyanê yên piştî agirbestê bifikirin.



Ev hemû birûskên ji nişka ve ji me re dibêjin ku siyaset dirêjkirina şer e û tu siyaset bê fikir û dîtingehan nayê kirin!

**Tu nikarî behsa siyasetê bikî û bêyî fikrekê hewl bidî ku di warê siyasî de çalak bibî! Di nebûna ramana siyasetê de, hem hûr û hem jî gir, ew tenê dibe sedema mafyayê!**

Tu şer tenê ji bo şer nayê kirîn, û şerê ji bo şer tenê di nav dînên ku nizanin çi dikin heya ku ji hev dernekevin û paşê nayên bîra xwe çi kirine?!

Pevçûnek di her cure şer de, bi awayekî demkî jî, dê raweste û dibe ku çend salan ji nû ve derkeve holê, lê di dema rawestanê de, divê hêzên ku xwe îspat kirine ku jêhatî ne û çiqas zirarê bidin wan, were fikirîn ka ji bo gel çi dikin?

Di dema agirbestê de bûyeran dijî û birêve dibe, û bi wateyek kûrtir, siyaset îro çawa rêve dibe û sibe çawa dirust dike? Siyasetvanek zana darêjerê pêşerojê ye.

# Sîstema her tim terorîst



**N. Elî Munezemî**

Di zivistana 2024an de, rejîma îslamî a Îranê bi fermî perde liser pîlanên xwe yên terorîstî hilda û di hejmara 60an a demsalnameya peyvendiyên derve ku li aliyê Konseya parastina berjevendiyên rejîmê ve tê weşandin, da zanîn ku ew yê di pêşerojê de bo bêdengkirin, bêbandorkirin û kuştina endamên sazî û partiyên sîyasî ên dijber, bi hemû awayekê û bixasma li rêka peyvendiyên xwe yên dîplomatîkve yê cehd bike.

**Ewa ku niha rejîm bi rêka qelemên kirêgirtiyên xwe ve diweşîne an jî karbidstên wên yê terorîst tînin zimên, tiştek taze nine bo me û bîrûraya giştî. Ew taktîka rejîmê di hemû heyamê desthilatdariya xwe de meşandiye û ewa ku îro rojê bas dike, li ber hindê ye ku hemû kes û alî li wan dek û dolabên rejîmê hesiyan e.**

Lê ewa ku balkêş bû di wê nivîsa qelemfiroşên terorîst de, ewaye ku rejîmê şêveya birêvebirin û mudîriyetkirina wan kiryarên nemerivane guhertiye û dixwaze wan çalakiyên terorîstî bi şiklek xorisk birêve bibe; berevajî ew çalakiyên terorîstîyên berê ku li bin birêveberiyek yekgirtî de birêve dibir û her carek ku terorîstek dihate girtin yan dezgehên evlehiyê li welat cudacuda zelaldikirin ku ew karê Îranê bûye, serê hemû têl û verîsan digihîşte konsûlxane û balyozxaneyên Îranê û paytexê wan, Tehranê.

Pîlanên birêveberên sîstema evlekariya rejîmê wê carê bo karên teror û dijberiya opozîsiyonê, pîlanên pirâlî û hîbrîd in ku li aliyekê dixwazin bi wan pîlanan pêşeroja rejîmê garantî û rêberê rejîmê li xwe razî bikin û li aliyek din jî dixwazin wisa tevbigerin ku ew dewletên teroran liser xaka wan birêve dibin, bi xweve girê bidin û ewan jî bo armancên xwe bikar bînin.

Dezhegên evlekarîyê a sîstema terorîst niha dixwazin pîlanên xwe yên terorîstî li hemû qadan de (leşkerî, aborî, medyayên girseyî, civakî û...) de birêve bibin.

**Piştî şoreşa «Jin, Jiyan, Azadî» niha dezgehên evlekarîyê yên rejîmê rêkûpêktir bihev re kar dikin ku bikarin motîvasyona endamên sazî û grûpên opozisyonê dabezînin û fersenda çalakiyan li wan bistînin.**

Ew di pêxema wê yekê de hazirin ku terorê berfirehtir li berê hember azadîxwazan û dijberên xwe bikar bînin.

Ew bo gihîştin bi meqsed û armanca xwe, bi eşkere bas li wê yekê jî dikin ku dam û dezgehên peyvendiyên derekî jî bo wê armancê yê bikar bînin.

Ligor nivîsa wan, wê carê teror tenê li şêveya kuştinê de nasekine, ewan bi çêkirina rûpelên înternetî û meydana saybirî de jî yê bi çalakiyên feyk û îftiralêdanê, dixwazin etmosferek nesax biafirînin ku çalakiyên opozisyonê di wê meydanê de bifetisînin û bêxin bin siya xwe de.

Ew her wisa bo tirsandin û bêbandorkirina çalakvanên siyasî li derveyî welat, dixwazin dezgeha xwe ya dîplomatîk bikar bînin bo çêkirina serêşî û nerihetiyan bo wan çalakvanan û kuştina wan.

**Çiqa sereke ya wan gef û xetera liser endam û alîgirên PDKÎ e. Ew yeka erka me mezêdetir dike û dibe em jî li hember wan pîlan û hereşeyên rejîmê de dest nedanin ser dest û bê bername nemînin. Rast e ku em wek wan nîn in ku karê terorê bikin, lê em dibe li pilan û bername û çalakiyên xwe de dibe li wan xurttir û bihêztir bin ku em bikarin wan li erdê bidin.**

Hemû ew teror û cinayetên rejîmê yek armanca sereke heye û ew jî ewaye ku rejîm dixwaze xelkê û opozisyonê li hev veqetîne û nehêle ne hizûra opozisyonê di nav xelkê de hebe û ne jî xelk gotin, siyaset û çalakiyên opozisonê bibînin û bibihîsin.

Bes eger wisa e, erka me ewaye ku em iznê nedin xwe li bin tu zextekê de nabe em destûrê nedin ku motîvasyona me di xebatê de were xwar û nabe em bihêlin ku peyvendiya me û xelkê qut bibe.

Nabe îzin bi mohreyên rejîmê bidin ku bi bilavkirina îftira û buxtanan kesayetiya endamên çeleng û aktîv bê şikandin.

Yanî parastina keramet û kesayetiya xebatkaran, xebat hember terorîzma devleta Îranê e.

Rejîma komara Îslamî niha di nava xelkê de çi piştevaniyek nemaye û tenê bi hêza zivir xwe liser piyan ragirtiye.

Ewê yeka jî rejîm hê dir û hov kiriye û li ber hindê jî xwe li encamdana tu cinayetekê naparêze.

Ber hindê jî peyvendiya navbera xelkê û hêzên dijber (bi xasma PDKÎ) yê hêzek hind mezin biafirîne ku yê wek babelîskê rejîmê bide pêşiya xwe û wê lekeya serşoriyê yê paqij bike.

Lê heta wê demê, nabe em hemebr pîlanên rejîmê de xemsar bin. Xemsariya me yê zirarê hem li me û hem jî yê li neteweya me bide.

Bes emê micidtir li caran, bi moral û motîvasyonek bilind, emê di xebat bo azadiya Kurdistanê û kurdan berdevam bin.



# Mirina dîktatoran jî gefê li jiyan û ewlehiya gel dike



N. Serbest Urmiye




Piştî ketina balafira ku bû sedema mirina Îbrahîm Reyîsî, Serok Komarê rejîma Îslamî ya Îranê û hevalên wî, gotin û şiroveyên cuda di rojeva Îran, herêm û cîhanê de tên bihîstin.
Îbrahîm Reyîsî yekemîn Serok Kmarê rejîmê nine ku kursiya serok komariyê pêşwext vala kiribe, ji bilî Ebulhesen Benîsedir ku serok komarî jê hate sitandin, di sala 1360'an a Rojî de jî Mihemed Elî Recayî, Serok Komarê vê demê hate kuştin. Lê faktera ku Reyîsî, ji Serok Komarên din diveqetîne, rol û kiriyarên wî ye di pêkhateya rejmê û kuştina girtiyên siyasî di havîna sala 1367'an a Rojî de.

Îbrahîm Reyîsî, Serok komarê niha û serokê berê yê dezgehê dadweriya rejîma Îslamî ya Îranê û berpirsiyarê aliyê kêm çar deh salên borî di tepeserkirina hovane û dijminê serekê yê azadîxwazên gelên Îranê tê hejmar. Ew berpirsê girtin, îşkencekirin, kuştin û li darvekirina bi hezaran dijberên rejîma Îslamî ye. Bi terzekê ku di dawiya salên 1980'an de, nasnavê "Qesab" anku bikûjê azadî û azadîxwazan jê re derket. Di heyamê serhidana "Jin, Jiyan, Azadî"yê de jî berpirsê sereke yê hemû tawanên rejîmê jî bû ku li dijî xelkê nerazî hatine tomar kirin.

Piştî wergirtina kursiya serok komariyê hertim hewil dida ku rolê xwe di kuştina girtiyên siyasî û pêlên li sêdaredana welatiyan di salên borî û nemaze di dema serokatiya dezgehê dadweriya rejîmê de bipeçêve û rûmeteke nû ji xwe pêşkeş bike. Bi terzekê ku bi çavê kesê herî nêzîk û wefadar ê Xameneyî, jê dihat mêzekirin. Tê gotin ku hewlên han yên Reyîsî, ew weke karaktereke ber çav di şerê desthilatê di pêkhateya rejîma Îranê de bo piştî nemana Xameneyî dida xuyakirin. Li gor karname û derbasbûya rejîmê, hewildan bo ji holêrakirina hevrikên desthilatdariyê jî kareke xwezayî ye û hatiye selimandin. Lewma mirina Serok Komar Îbrahîm Reyîsî jî şirovêyên cuda hildigire.

Kirîza ku piştî nema Îbrahîm Reyîsî ber bi rûyê rejîmê dibe, nemaze di rewşa niha ya necihgîr û şepirze ya rejîmê di hindurê welat û piştî serhildana" Jîna"yê, gellek girantir e ji kirîza derve li ser rejîmê. Ji ber ku li gor esla 131'an a destûra bingehîn ya rejîmê divêt ku serokê dezgehê dadweriyê, serokê Meclîsa Şêvra Îslamî û cîgirê yekem ê serok komar, di heyamê 50 rojan piştî nemana serok komar de, pêvajoya hilbijartina serok komar birêve bibin. Bi berçavgirtina astê herî bilind yê baykot û beşdarî nekirina gel ku di hilbijartinên her du gerrên borî yên hilbijartinên serok komariya Îranê di sala 1400`an û meclisa îslamî û meclisa "Xubrigan" a rêberiya rejîmê di sala 1402`an de hatiye tomar kirin, eşkere ye ku hilbijartina pêşwexte bo rejêmê dijwartir dibe. Nemaze ku divêt rejîm di demeke kêm de keseke wefadar bi rejîmê û Xameneyî destnîşan bike.

Hewldan ji bo beşdarkirina gel di pêvajoya hilbijartinê de, bo nîşandana meşrûiyeta rejîmê di rewşa niha de hewcehiyeke sereke ye ku ji hertiştî zêdetir rejîmê ber bi rûye lêgerrên micid dike. Ya herî zêde rejîmê ber bi rûye lêgerreke esasî dike, eva ye ku niha her êşek ku pêsîra rejîmê digire, şahiyê dixwe dilê gel. Ji dorandinê di qadên werzişe de bigire heya sernekewtin di êrîşên mûşekî li dijî dewletên din de û ... Eva şahiya mirina Reyîsî jî hate ser ku rejîmê dîsan gef ji xelkê kirine.

Lewma her di roja yekemîn a piştî mirina Reyîsî de, berpirsiyarên rejîmê hewil didin ku rewşeke awarte di hizir û raya giştî de biafirînin û bazara xwe ya hilbijartinê gerim bikin. Bê heger nine ku Mihemed Cewad Zerîf, wezîrê berê yê karê derve yê Îranê, ketina balafirê sûçê Amerîkayê dide zanîn û tîne ziman Ku serbarê biryara Dîwana navneteweyî ya Edaletê, dewletên yekbûyî yên Amerîkayê hêj kiriîz û dorpêça firotina firoke û hewcehiyên firokeyan bo ser Îranê berdewam dike. Helbet heta nivîsîna babetê, helwesta Amerîkayê li dor gotinên wî nehate dîtin.

Di heman demê de ku berpirsiyarê rejîmê yên weke Zerîf, hewil didin raya giştî ya hindur Îranê li dijî Amerîka û Îsrayîlê han bidin, ragihandinê Îsrayîlê jî ragihandin ku mirina Reyîsî bo gelê Îsraylê nûçeyeke nexweş nebûye. Hevdem şirovekarên Îsrayîlê yên weke Muneşe Emîr, ji derfetê mifahê werdigirin ku bervajî berpirsiyarên rejîmê, rewşa hindur li Îranê aloz bikin. Muneşe Emîr, di hevpeyvîna xwe tevî kanala telefîziyonê ya"Iran international" a Farsî de pêş bûyerê dikeve û di pêgeha bergiriyê ji Îsrayîlê de derdikeve ku renge berpirseke din yê rejîmê weke Zerîf, bûyerê bi serê ÎsrayIlê de bişkîne. Ew hegera bombekirina firokeya Reyîsî tîne ber bas û hewil dide ku destên neyar di pêkhteya rejîmê de, tê de bide selimandin. Di heman demê de jî hewil dide pirsgirêkê ji dewleta xwe dûr ragire û di navbera rejîm û gelên Îranê de pêş bixe ku encam jî ji bilî tepeserkirina gel ji aliyê rejîmê ve tiştek din nine.
Eva jî di demekê de ye ku dîsan dubarekirina sinariyoya kuştina terorîstê mezin Qasim Silêmanî di holê de ye û rejîm ji ber kêrnehatîbûna xwe di astê xizmetkariyê û tepeserkirina azadiyên takekesî û civakî de, dîsan hewlê dide ku dengê gel bifetisîne, di vê derheqê de jî weke bûyera pêşîn û di demeke herî zû de, jî bo kontirolkirina hêza gel, tayê hêza întizamî yê rejîmê bo çavdêriya torên civakî û înternêntê"polîs Feta " di daxuyaniyekê de gef ji xelkê kirine.

Di daxyaniya han de de hatiye ku piştî mirina Reyîsî, Emîr Ebdullahiyan û şanda hevrê ya wan li dema ketina firokeyê di parêzgeha Tewrêzê de, hejmareke zêde ji bikarhêneran torên civakî kêfxweşiya xwe nîşan dane. Di vîdeoyên bilav kirî de li ser torên civakî, hatiye dîtin ku li hin bajaran êvariya roja Yekşemê dema ku nûçeya ketina firokeyê hatiye ragihandin, welatî bi govend û dîlanê derdikevin. Di heman daxuyaniyê de hatiye ku hemû welatiyen han ketine bin çavdêriya polîs û dê cezayê xwe wergirin.

# Zimanê Kurdî hebûna miletê kurd e



N. Mustafa Ozçelîk




Bi hilkevta 15ê Gulanê ku gerçi bi avayekî fermi wek roja zimanê Kurdî nehatiye naskirin û ev roj nefermî ji aliyê gelek ji Kurdan ve ev çend sale tê pîrozkirin.

Ji bo lêxwedîderketina zimanê kurdî, berîya her tiştî divê em bi kurdî biaxivin, em kurdî fêr bibin.

Celadet Bedirxan û hevalên xwe di 15ê Gulana 1932an da hejmara yekem a Kovara HAWARê derxistin û heta 1943yan 57 hejmarê govara HAWARê hatne çap û belavkirin.

Girîngîya Kovara HAWARê, ewe ku, yekemîn kovara kurdî ye ku bi tîpên latînî hatîye weşandin.

Ji ber vê yekê, 15ê Gulanê, ji alîyê hinekan ve wek ''Cejna Zimanê Kurdî'', ji alîyê hinekan ve jî wek ''Roja Zimanê Kurdî'' hatiye diyarîkirin û tê pîroz kirin.

Em Celadet Bedirxan û hevalên wî bi rêzdarî bi bîr tînin û spasîya wan dikin.

Belê, roja 15ê gulanê jî di nav de, ji bo zimanê kurdî ( kurmancî, kirdkî/zazakî) gelek çalakîyên cûr bi cûr têne li dar xistin, xebat têne kirin.

Helbete ku hemû çalakî û xebatên ji bo zimanê kurdî girîng in, pîroz in û divê em piştgirîya wan bikin.

Lê bi baveriya min, li gel van xebat û çalakîyan, nuha ji bo zimanê kurdî berîya her tiştî divê em van çar tiştên esasî bicîh bînin.

**Yekem:** Her kurdekî ku bi kurdî nizane, divê kurdî fêr bibe.

Her malbateke kurdan divê zarokên xwe fêrî kurdî bikin; divê di nav mala xwe û di her beşên jîyanê de zimanê me yê esasî kurdî be, em bi kurdî biaxivin.

**Duyem:** Bi qasî vê gava yekem, tiştekî din yê girîng jî heye ku, mixabin gelek alî û kes paşguh dikin.

Ew jî dersa bijarte ya kurdî ye.

Ji alîyekî ve malbatên kurd bi hêjmareke gelekî kêm ji bo zarokên xwe serî li dersa bijarte ya kurdî didin. Ji alîyekî jî wek ku dewlet ji dersa bijarte ya kurdî jovan bûbe, astengîyan derdixe, gelekî kêm mamosteyan tayî dike.

Ji ber vê rastîyê divê em bi awayekî cidî li ser vê mijarê rawestin. Divê em bikaribin her sal 200.000 zarokên kurdan li dersa bijarte ya kurdî qeyd bikin û her ku here zêdetir bikin.

Ji bo 200.000 hezar zarokan dê herî kêm pêwîstî bi 2000 mamoste û bi milyonan pirtûkên dersê hebin.

Ma gelo ev tu heyecanê nade we?
Ev herdu gav, dê rêya bidestxistina mafê perwerdeya bi kurdî û fermîbûna zimanê kurdî xweştir û xurtir bikin.

**Sêyem:** Divê xebateke berfireh bê meşandin da ku zimanê kurdî bibe zimanê fermî û perwerdeya bi zimanê kurdî bê qebûl kirin û di qanûna bingehîn û hemû yasayên peywendîdar de ev maf bêne garantî kirin.

**Çarem:** Divê hemû şaredarîyên li Kurdistanê li gel tirkî, kurdî (kurmancî, kirdkî/zazakî) wek zimanê fermî yê şaredarîyê bikar bînin.
Kreşên zarokan ên bi kurdî û dibistanên bi kurdî vekin.Hemû dezgehên sivîl û meslekî yên li Kurdistanê jî ji bo bicîh anîna axaftin û fêrbûna zimanê Kurdî, divê seferber bibin da ku amûr û îmkanên pêwîst bêne ava kirin.

Belê, ev çar gav, dê sîstema asîmîlasyonê bi awayekî bihêz bihejînîn, dê rê vekin da ku bi milyonan kurdên ku bi kurdî nizanin bikaribin bi kurdî biaxivin, kurdî fêr bibin.

Kurdî hebûna miletê kurd e, heykelê netewetîya me ye. Ji bo ku em bikaribin rê li ber zext û asîmîlasyona li ser kurdî bigrin, werin em ji pêkanîna van her çar gavan destpê bikin.








## Nerîna



**"Selahedîn Demirtaş":**

**"Dewlet pisîk û mirîşkên kurdan jî wek terorîst dibîne"**



**"Morgan Ortegas":**

**"Bi mirina Îbrahîm Reîsî ya muhtemel tu guhertinekê di siyasetên Komara Îslamî de dernaxe, ji ber ku her tişt di destê rêberê rejîmê Elî Xamineyî de ye"**



**"Ultimatuma Gantz" :**

**" Eger di nava 20 rojan de plana çalakiyê ya ji bo bidestxistina armancên stratejîk neyê pêşkêşkirin ez ê ji koalîsyona bi Netanyahu re vekişim"**



**"Robert Setloff":**

**"Ger Joe Biden carek din were hilbijartin, di hikûmeta xwe ya nû de, yan dê "ruhê Bercamê" vejîne, yan jî dibe ku bi "zêdekirina givaşên leşkerî" li ser Komara Îslamî, bijardeyên nû yên dîplomatîk ji bo sepandina mesrefan li ser Tehranê çêbibin"**

# Îran dibêje dibe ku êdî ew bombeya etomî bixwazin!



**N. Eskender Ceiferî**



Di rojên derbasbûyî de Kemal Xerazî şêwirmendê Elî Xamineyî û herwisa hin berpirsên bilind ên rêjîma Îranê ragihandin ku heke Rojava û Îsraîl siyasetên xwe neguherin, dibe ku Îran êdî bixwaze bombeya etomî berhem bîne.

Piştre Josef Borel berpirsê siyasetên derve a Yekîtiya Ewropa ji Îranê xwast dev ji vî karî berde.
Hin siyasetvanên Ewropî dibêjin Borel hertim li hemberî Îranê nerim bûye û pêwîst e bihêztir be.

Di dema desthilatdariya Hesen Rûhanî de, Mihemdcewad Zerîf wezîrê derve yê rêjîma Tehranê çend caran ragihand ku êdî rêkeftina Etomî ji aliyê wan ve nakeve ber bas. Ev jî di demekê de bû ku welatên Birîtanya, Fransa û Almanyayê ragihandibûn ku ji bo nîşandana niyazpakiya xwe, reşnivîsa li dijî Îranê nadin Ajansa Navdewletî ya Etomê.

Piştre Donald Trump serokkomarê berê yê Dewletên Yekbûyî yên Amêrîkayê dewsa xwe da Joe Biden û dihat pêşbînîkirin ku dewleta Biden vegere ser gotûbêjan ji bo rêkeftina etomî bi Îranê re. Di vê navberê de Rêformxwaz hertim dibêjin rêkeftinê dixwazin lê Sipaha Pasdaran dibêje nabe rêkeftin bê kirin.

Di rastî de armanca rêjîma Tehranê berhemanîna bombeya etomî ye. Ew, demê bi kar tînin û bi meyandina Oranyoma zêdetirî 20 ji sedî, nêzîkî berhemanîna bombeyê dinbin.
Niha dewleta Biden jî dixwaze rê li ber Îrana Etomî bigire û ragihandiye ew dixwazin ji bo rêgirîkirin ji berhemanîna bombeyê ji aliyê Îranê ve her karî bikin.

Îsraîl jî bi Amêrîkayê re hevnerîn e û dibêje nabe Îran bibe xwediya bombeyê.
Komara Îslamî jî bersiva berpirsên Îsraîlî û Amêrîkî dabû û gotibû: Wê cîhan wan gunehbariyên ku rayedarên Îsraîl dike, ji bîr neke. Heke Rojava û Îsrsîl siyasetên xwe neguherin, dibe ku Îran dest bi çêkirina bombeyê bike. Piştî ku Donald Trump peymana etomî ya bi Îranê re bi tundî rexne kir, Rex Tillerson wezîrê Derve yê Amêrîka jî xwest rêkeftina etomî ya bi Îranê re were guherandin û jinûve were nivîsandin lê ji bo razîkirina Îranê ew libenda piştgirîya hevalbendên xwe yên Ewrupî ne.

Berpirsên Amêrîkî dibêjin xalên rêkeftinê têra xwe bihêz nîn in û rê li ber bernameya etomî ya Îranê nagirin.

Beriya niha Sergey Lavrov Wezîrê Derve yê Rûsyayê ku ji bo Civata Giştî ya Neteweyên Yekbûyî li New Yorka Amêrîkayê bû, li ser helwêsta Amêrîkayê ya di mijara Îranê de dabû xuyakirin ku helwêsta nelihevkirinê ya Joe Biden û berî wê jî Donald Trump serokkomarê wê demê yê Amêrîkayê bi Îranê re û rexnekirina bernameya etomî ya Îranê cihê fikarê ye.

Feranse, Brîtanya û Almanya difikirin ku eger Îrana Etomî bikeve Rojhilata Navîn, ewê pêgeha xwe ji dest bidin. Lewma jî reşnivîsa li dijî Îranê nedan Ajansa Navdewletî ya Etomê ji bo ku niyazpakiya xwe nîşan bidin û Îranê vegerînin ser maseyê. Lê bi daxuyaniyên berpirsên bilind ên Îranê ku dibêjin dibe ku ew bombeyê jî bixwazin, didin xuyakirin ku êdî Îran rêkeftinê naxwaze.

DYA bi raportên çalakiyên etomî yên Îranê re bi baldarî riftarê dike û gotara wezareta Derve ya Amêrîkayê hemû wan pirsyaran bersiv nade ku çima Amêrîka di îmzekirina raportan de dudil e û sedem çi ne lê bi gotara berpirsên dewleta Îbrahîm Reyîsî zelal dibe ku ne tenê dorpêçên nû yên aborî, gefê li rêkeftinê dikin, lê belê Îran tiştekê kêmtirî bombeyê naxwaze.

Rêkeftina etomî di roja 14ê Tîrmeha 2015an de bi tevlîbûna welatên ewropî hatibû wajokirin û li gor wê, Îranê hin çalakiyên etomî kêm dikirin û di hember de jî dorpêçên aborî li ser Îranê dihatin kêmkirin.

Îsraîlê ji destpêkê ve ragihand ku ew, vê rêkeftinê naxwazin. Beriya niha jî berpirsên saziya Nehêlana Çekên Etomî ragihandibûn her qasî ku Îranê bi hemû wan welatan re lihev kiriye, lê çavên Ewropiyan li Amêrîkayê ne. Her biryarekê ku Waşington distîne, ji wan re dibe bandor. Birîtanya hewl dide DYA razî bike ku raportên li ser çalakiyên etomî yên Îranê demlidest wajo bike lê Biden tevî ku ji Trump nermtir e, lê ew jî li pey planeke din digere.

Ji bilî berpirsên bilind ên Îsraîlê, fermandarên wan jî didin xuyakirin ku eger rêkeftin bê kirin, Îrana Etomî, wê Rojhilata Navîn dagir bike.

Almanya, Birîtanya û Feransê ku rolele mezin di rêkeftinê de hene, dibêjin bi meyandina 20 ji sedî zêdetir a Oranyomê, êdî derfet ji bo rêjîma Tehranê çê dibe ku zêdetirî berê bo ser cîhanê bibe gef.

Di beşeke din a daxuyaniyê de tekez hatiye kirin ku meyandina vê asta Oranyomê ne ji bo karûbarên pizişkiyê û ênêrjiyê ye lê belê li tevahiya cîhanê, ev asta Oranyomê tenê ji bo karûbarên çek û berhemanîna bombeyê têne bikaranîn.
Li bendê ye piştî derketina vê rastiyê ku Îran dixwaze bombeya etomî çê bike, Îsraîl û Rojava jî helwêstên xwe bînin ziman.

# Ben Bin Xanik an jî salnameya kurdî ku avahiyeke li Îranê û ya serdema Sasaniyan e



N: Rojan Kurmanc
W: Hesen Mukerem



Hemî kronometreyên rojê yên li cîhanê tenê dikarin hin rojên salê wekî destpêka demsalê diyar bikin û li gorî sala rojê jî nayên eyar kirin, lê ev avahî dikare hûrguliyên rojên cûda yên salê û mehan jî diyar bike.

Şonwarnas li ser vê baweriyên e ku zerafeta vê kronolojiya hemû keviran ew qas e ku afirînerên wê bê şik ji mijarên stêrnasiyê yên rast û pêşkeftî ne, sala paşîn, dûrketina dinyayê ji dora rojê, gewrbûna erdê, cudahiya di navbera stûna magnetîkî û stûna erdnîgarî de, riya gerandina erdê li dora rojê û... hay ji wan hebûye.

Ev avahî hat kohed di nav gel de bi navê Kabeya Zerdeştî tê zanîn ku di serdema Sasaniyan de hatiye avakirin û navê Bin Xanik jê re hatiye hilbijartin.

Bin Xanik li Îranê, gundê Zengîavay a ser bi bajarê Mirovdeşta ser bi parêzgeha Fars e.

Ev avahî avahiyek ji kevirê çargoşe ye û di şiklê çarqoziya çargoşe de ye û bi derenceyan bi erdê ve girêdayî ye, û bilindahiya wê bi qasî 12 metran e, ku digihêje 12,14 metreyan bi tev de pêlên sêalî û aliyê her yekê ye.

Bingeh bi qasî 30.7 metre dirêj e. Di ketina wê de, merdimaneke kevirî ya ji 30 gavî derdikeve hundirê odeya wê û parçên kevrên wê bi şkilê çarqozî ne û bê bikaranîna heriyê li serhev çinîn e.

Li ser beşên bakur, başûr û rojhilatê vê bircê sê nivîs hene ku di serdema Sasaniyan de bi sê zimanên Pehlewî ya Sasanî, Pehlewî ya Partan û Yewnanî hatine nivîsandin.

**Bin Xanik an jî Kronolojiya Kurdî di serdema Sasaniyan de ji aliyê Medan (Kurdan) ve hatiye çêkirin û derbarê navê avahiya wê serdemê de agahiyên rast nînin, lê di serdema Sasaniyan de jê re gotine Bin Xanik. Lê têgeha Kabeya Zerdeştî piştî ku Ereban êrîşî Îranê kirin, ji ber ku hizir dikirin ku ew cihê îbadetê ye, li ser vê avahiyê danîne.**

Derbarê bikaranîna vê odeyê de nêrîn û şiroveyên cuda hatine pêşkêş kirin û yek ji wan jî wek teqez nayê pejirandin, ji ber ku hinekan vê avahiyê wekî perestgeha agir û cihê agir dihesibînin û di wê baweriyê de ne ku ev avahî cihê ronahiyê bûye.

**Agir û cihê perestina Zerdeştiyan Li cihekî din ev avahî ji ber hevşibiya xwe bi hin gorên li Lîkya û Karyayê re wek gora yek ji şahên Medyayê tê dîtin. Hin kes wê perestgeha Mîtra û Anahîtayê dihesibînin.**

Lê teoriya herî girîng a ku herî zêde bi avahiyê re lihevhatî ye bi kronolojiya kurdî ve girêdayî ye.

Di nav kurdên Yarsan de pênc rojên dawî yên salê jî pîroz dikin an jî amadekariyên Newrozê dikin, yanî ev pênc şev ne sala kevin û ne jî sala nû ne.
Ev avahî çar vebûnên pencereyê hene û her vebûnek sê gavên şikestî hene, her vebûn demsalekê û her gavek şikestî jî mehên wê demsalê temsîl dike. Ev avahî sî derence hene, ku demsalan û mehê li gor dem û tîrêjên aliyên nêrdewanên şikestî û tîrêjên rojê yên li ser derenceyan nîşan dide, ku tê wê maneyê ku di roja yekem a salê de roj ji derenca yekem dernakeve. Meh di roja 30 de kêmtir e. Di meha Reşemeyê de heta derenca 25'an roj dernakeve.

Lê di nav kurdên elewî yên ku hê jî li cihê xwe ne û dozên Xorasanê, li ser wê yekê ku zêdetirî 400 sal in ku vegeriyane li ser mesebê Şî`e, hîna jî gelek ayîn û adetên xwe parastine.

Di nav kurdên Xorasanê de, ev pênc şev bi navkirinê dest pê dikin û bi rêûresmên taybet bi dawî dibin û xelk xwe ji bo cejna Newrozê amade dikin, tevî ku kurdên Xorasanê salên dirêj e ji bîr kirine ku komkirina daran û agirê Newrozê pêxin. Di nava Zerdeştiyan de jî adet e ku navê van pênc rojan bi kêmrengî tê dîtin.
Lê kurdên Xorasanê navê van pênc şevan dan , Kurdên Xorasanê ji van pênc şevên jinebiyê re dibêjin (jine bî) ji ber ku ew ji şert û mercên kronolojiyê bêpar in, wek ku di Avahiya Bin Xanik an jî kronolojiya kurdî de hatiye gotin, roj ji roja 24`an heta roja dawîn 5 derencan ronî nake.

Lê her yek ji pênc şevan jî navekî bi helkefteke kurdî ya taybet heye:
**Şeva yekem:** El-Elefe girtîgehê (zindegan) hevdîtin û şevek beriya sersalê bi xizm û hevalên xwe re ye.
**Şeva duyemîn:** Elefa Merdan (miriyan), serdana goran û merasîma bîranînê ya miriyan.
**Şeva sêyemîn:** Circirk; Li dora hev kombûn û lîstikên komî fîzîkî
Şeva çarem: Qirqirek; Li dora hev kombûn û civatên şevan û lîstikên hizrî.
**Şeva pêncem:** Jine bî (bêvejin) şeva berî sersalê ye ku merasîmên wek şîret û bersiva erênî ji malbata bûkê tê lidarxistin.



# Nezanî valahîya herî mezine di navcîhana mirov de



N. Hasan Harrani



Ecêbekî mirov jî ewe ku mereqdare û birçîyê hînbûnê ye. Lê hêlekî ecêb ya mirov a din jî ewe ku çi tewir riya hînbûnê a hêsan hebe wî dipejirîne. Di pedegojîya rojhelata navîn de rêbaza pedegojîyê ya ramîndar nîne. Ev bi zanetî û bi pîlan hatîye pejirandin. Di şûna vîya de paketên safî û amade hatine pejirandin.

Ger caîz be wek xwarina amade tê pêşkêşkirin.

Yanî perwerdekar jiber hînkarve him fikirîye him bersiv dîtîye û bi wî awayî zanîn tê teslîmkirin.

Riya pirsîyarîyê, ramandinê û analîzê ji hînkar re nayê hiştin. Bi vî awayî mejî û zêhna mirov û civakê her dem û her roj bi vê zanîna formatkirî tê dîzaynkirin.

**Di her perwerde û weazan de cîhana ebed tê bibîrxistin. Cihê vê tezekirin û zîndîhiştina vê zanîn û hişmendîyê mizgeft û kombûna minesebeta şînaye. Cihê teazîyan. Li van deran di bin navê bibîrxistina cîhana wî alî, agirê azabê, bê parmayîna ji lutfa Xweda û şefaate peyamber û behiştê mejîyê mirovan tê xesandin. Xwesteka lêgerîna azadîyê û jînekî bi heysîyet tê perdekirin.**

Macereya gera ji jînek baş û qenc bi vê metoda tirsandinê tê bi dawîkirin. Ev metod wer bi rêbazên hûr û zirav hatîye amadekirin ku ti temenekî jibo vegotina vê sextekarîyê jibo ji yekî re bêjî û serwext bikî xerc bikî têrî nake. Îmkana ku ti mirovan bi vê yekê bidî bawerkirin û bêjî ev ne rast e û ev jibo hun rastîyê nebînin dibêjin û ti wî pê bidî bawerkirin nîne.

Ev rewş wekî weqiayekî bê hevî li ber destê mirov dimîne.

**Xesandina rih û gîyan û ramana mirov feleketa herî mezine ku li ser rûyê vê cîhanê bi destê mirov li hemberî mirov bi navgîna ol û bawerî hatîye kirine. Çawa ku ji nêrîyê xesandî zêdebûn çênabe ji rih û gîyan û ramana xesandî jî ti car hêz û çareserî peyda nabe.**

### Çare Çîye û Bi Çi Awayî Pêkan e?

Li rojhelata navîn sed car hatîye îspatkirin ku derketina li hemberî vê zêhna xesandî de, bawerî û qeneate li dil û mejîyê mirovan hatîye ronîştin bi tûndî ti carî nayê rakirin û hilweşandin. Her wiha ev rêbaz ti car çareserî û azadî nayîne. Çareserî neqandina zanînane.

Çawa ku ev hişmendî û bawerkirina ji dervayî zagon û yaseyên xwezayî bi zanînên dervayî mentiq û zanyarîyê bicihbûye, rakirin û veguherandina vîya jî bi zanînên aqilane, manewîyata xwezayî, çêkirina teswwira Xwedayî li ser esasên hezkirin, bexşandin û şewqetê pêkan dibe.

Ew rûyê Xwedayî ku çawa bi tirs û xofê, bi cezakirin xedrê hatîye bezmandin û ew rû li ser rûyê mirovan eksa xwe dîtîye, dema beravacîyên vana teswîr û tesewwirekî Xwedayî bê kirin wê ew dem ev eksê dil û zêhna mirovan jî bike û ev bibe sedema hezkirin, xweşbînî û rûmetdayîna nabeyna mirovan jî.

Armanc îkamekirina ramana azad, aqlê analîtik û afirandina merhametekî beşerîye li rûyê vê cîhanê.

Taybetmendîyekî mirovên rojhelata navîn jî ewe ku bi dîtina çavên xwe bawer e. Tiştek ger bibîne, tam bike û bijî pê bawer dibe û ew ji xwe re dihebîne.

Avakirin û afirandina ramana xweafêr, jîyana adil û bi xêr û bêr, hêsankirina şert û mercên jîyana mirovan û civakê rakirina tirsê dikare bibe destpêka gelek guherînan li nava cîvakê.

Li şûna tirsê û tirsandinê dayîna ewlebûnê, dayîna wêrekîya hizirandin û pêşdeçûnê jibo mirovan û civakê xalên herî girîngin.

Di nava civakê de tevî hukmê gotina rast û zanîst bi hukmê vê zanînê afirandina derfet û navgînên jîyanê û hilberînê dikare bibe bingehek pira çûna pêşerojê ya ronahî.


Mrov û civak biqasî ku bikaribin fam bikin guhdar dikin û ji zanîn û zanyarîyê sûd digirin. Hişê mirovan. Wergirtina hînbûnê û famîyê bi sînor e. Tişta zêdeyê kapasîta xwe nikarin werbigirin. Dema hun ji ser asta kapasîteya wan zanînê bidin wan şûna guherîn û famkirinê pêşde bixwe, wê sarbûn û destjêkişandinê bi xwe re bîne.

Ev dişibe vîya: ji qeweta mirovekî zêdetir bar bidî ser pişta wî, wê ji kr bireve . Hêz û performansa xebitîna aqlê mirovan jî wihaye. Di karê hîndekarîyê de jî divê mirov vana baş bigire balê.

**Bêyî afirandina jîn, jîyan û navgînên jîyanî û civakek alternatîf ti îmkana ku ti bikaribî li rojhelata navîn guhertin û şoreşên mezin û aqlî pêk bînî nîne. Tekoşîna tûndravî li hemberî hişmendîyê jibo yê tekoşer felakete. Lewre di dawîya dawîde ew di binê wê rûxandinêde dimîne û civak jî di demek kurt de rîcat dike.**

Li rojhelatanavîn herdem ev pêkhatîye, Ew çax divê mirov tişta ku bi dehan caran hatîye ceribandin dîsa dubare neke.

# Şaneder, serçaveya têgihîştineke nû ya cîhanê ji “Neanderthal”an



N. Bêhzad Qadirî
W. Bêhzad Simko

Kurdistan yek ji kevnartirîn cihên cîhanê ye û li kîjan warî ve mêzeyî cografiya û dîroka vê bikin, gelek mijarên xwedî nav û deng û cihê heyrîmanê dibînin. Lêmixabin bi sedema vê yekê ku em ê Kurd xwdiyê kiyaneke serbixwe nînin û xwdiyê damezraveyên pêşkevtî yên hikûmî nînin, lêkolînên hûr li ser naehatine kirin. Ji aliyê din ve, dagîrkeran ne tenê hewla dagîrkirina cografiyaya me dane, belkû hevdem hewla çewtkirina dîroka me jî dane. Li vê gotarê de bi nasandineke kurt a şikevta Şanederê û herwisa baskirin jî jiyana “Neanderthal”an ên li vê şikevtê û girîngiya vê, dixwazim bibêjim ku Kurdistan yek ji kevnartirîn cihên cîhanê ye û cihê jiyana mirovên “ Neanderthal” û mirovên destpêkî û cihê avabûna yekem şaristaniyan e û hewceye, Kurd gelek bi girîngî mêzeyê wan mijaran bike û li ser lêkolînên zanistî bike. Hewce ye ku vê yekê jî bizanin ku niha şikevta Şanederê, bûye serekaniya têgihîştineke nû ya cîhanê ji “Neanderthal”an

**Şikevta Şaneder**

Şikevta Şanederê li beşa başîrê çiyayê “Biradost” li dola Zêya mezin û nêzî bajaroka Şanederê, li bakûrê rojhilata bajarê Hewlêrê de cih girtie. Bilindahiya şikevtê li asta avên azad, 2 hezar û 100 pê anku 640 metran bilindtir e û panatiya derê şikevtê li derve 25 metr û li hundirê şikevtê jî 35 metr in, bilindahiya hundir 8 metr e û 40 metran jî kûr e. li vê şikevtê de hestiyên mirovên cura “Neanderthal” hatine peydakirin ku yê 70 hezar sal berî niha ne û herwisa hestiyên pez, bizin û kîselan jî li vê şikevtê de hatine peydakirin.

Yekem kesê şareza ku li vê şikevtê de karê kolan û lêkolînê kir, “Ralph Solecki” ê Amerîkayî bû ku li navebra salên 1951 heta sala 1961 bo 10 salan lêkolîmêm hûr kirin. Li sala 2019 de li encama çendîn kolîn û lêlkolînan de li qatên hundirê şikevtê, çendîn hestî hatine peydakirin ku dîroja jiyana wan li vê şikevtê de vedigere bo 70 hezar sal berî niha.

Peyva “Şaneder” ji 2 peyvên “Şane” bi wateya “xane” û Der” bi wateya “vekirî an der” e ku wateya giştiyavê dibe “Dereiyê xane an malê”. Li hinek çavkaniyan de jî îşare bi vê yekê hatiye kirin ku navdêrkirina vê şikevtê bi şaneder, vekehviya vê digel şaneya hingivîn heye. Herwisa pêka dîtingeheke din navê şikevtê bi sedema nêzî digel gundê Şanederê, bi vê navî hatiye navdêrkirin.

**“Neanderthal”**

Ji hezaran salên derbasbûyî ve heta niha, curên mirovan û sîma û qewareya wan bi derbasbûna dem, guherînên kûr bi ser de hatine. Zanayên warê “Anthropology” anku mirovnasî kevnarnasî, hêj li hewlê de ne ku li wî warî de zanyariyên zêdetir bi dest xwe ve bînin û li ser nêzîktirîn curên mirovan bi me ku ew jî mirovên “Neanderthal” in, şirove û rohnkirinên zêdetir bidin.

Zêdetir ji 300 hezar sal berî niha, mirovên “Neanderthal” ji Rûsiyê ve heta qiraxavên deryaya Atlantîk belav bûn û nêzî 40 hezar sal berî niha ji nav çon. Lê li Asiyayê de “Neanderthal”an hezaran cur alavên kevirî li pey xwe hiştine.

Li cîhanê de bo yekem car, paşmaweyên “Neanderthal” li sala 1830 a Zayînî li welatê “Bêljîkê de




hate peydakirin. Pisporan wa hizir dikir ku mirovên cura “Neanderthal” mirivên destpêkî bûne û şêwaza jiyana wan gelek destpêkî bûye.

**Peydakirina hestiyên cimcimê serê jinek a mirovên “Neanderthal” li Kurdistanê Li sala**

1951 a Zayînî, dema ku bo yekem car hestiyên 9 mêr û jin û zaroka mirovên “Neanderthal” li şikevta Şanederê de hatine peydakirin, bo cîhanê derkevt ku mirovên “Neanderthal” jî mirovên



aloz, hişmend û xwediyê rêûresmên olî-civakî bûne, çimku laşên wan mirovan bi yek şêwazê bi axê hatibûne spartin û rûyê hemûyan bi yek aliyî bûye.

Piştî sala 2018, cimcimê serê jineke “Neanderthal” ji aliyê tîmeke zanîngeha “Cambridge” a Birîtaniyayê ve li şikevta Şanederê de hate peydakirin. Li vê derheqê de Dr. “Emma Pomeroy” ê pisporê mirovnasiya kevnar ragihand: “Ew jîna Neanderthal, li naverasta çileya temenê xwe de miriye. Ti hestiyeke serê vê jinê li cihê xwe de nemabû, çimkî gelek xirab çikestibû”.

Hestiyên serê wê jinê her bi vê şêwazê hatine hilgirtin û bi îzna Hikûmeta Herêma Kurdistanê bo Birîtaniyayê hate birin ku li wir lêkolînan li ser bikin. Piştî kareke dijwar û hişyarane, hestiyên serê wê li cihê xwe de hatine danîn‘ cimcimê serê wê hate çêkirin. Piştre bi rêya tekniolojiya pêşkevtî bi şêwaza 3alî, rûkê vê hate çêkirin û bi “Şaneder Zêt” hate binavkirin û bû mijareke bingehîn a fîlmeke “Netflix”ê jî.

Pêdiviyê gotinêye ku hestiyên wê jinê yên peydakirî, peresû, sermil, diran, maziyepişt û destê rastê wê bûn. Karkirin û liserhevkirina hestiyên wê jinê nêzî salekê dem hewce bû, çimkî hestiyên wê gelek nerim bibûn û hewcehî bi qahîmkirina wan hebû.

**Girîngiya li vê mijarê de çiye?**

Peydakirina cimcimê serê miroveka “Neanderthal” ku diroka vê zêdetir ji 70 hezar salê berî niha ye, ne tenê bo Kurdistanê cihê nirxê ye, belku tevahiya cîhanê bi girîngî mêzeyî vê dikin bi taybet ji warê zanistî ve.

Wek mînak, peydakirina çendîn mirovên “Neanderthal” li şikevta Şanederê, dide xuya ku li çendîn dewranênan kevin de mirovên “Neanderthal” li Kurdistanê de jiyane û mirine û li vê şikevtê de bi şêwazeke civan bi axê hatine spartin rêz ji wan hatiye girtin. Ew zanyarî û bi serhatiya dîrokî û şûnwarnasiyê, zanisteke serast û girîng bo dîroka mirovahî û Kurdistanê ye û zanîngehên cîhanê bi çaveke gelek girîng mêzeyî vê dikin, da ku zanyariyên zêdetir li ser mirovên cura “neanderthal” bi dest xwe ve bînin.

Ji aliyeke din ve, şikevta Şanederê bûye cihek ku her kesek li cîhanê bixwaze lêkolînê li ser şûnwaran bike, divê vegerê bo vê şikevtê. Peydakirina sedema jinavçona mirovên “Neanderthal” jî bi rêya Şanederê û pêgeha Kurdistanê li warê şûnwarnasiyê ve bi cîhanê dide nasaandin.

**Gotina dawî**

Hebûna mirovên “Neanderthal” li Kurdistanê bi wateya kevnarbûna jiyan û şarstaniyeta mirov li Kurdistanê de ye. Her wisa nîşanderê vê yekê ye ku Kurdistan yek ji girîngtirîn deverên serîhildana jiyan û şaristaniyeta mirovê modern e. niha êdî şikevta Şanederê bûye serkaniya têgihîştina nû ya cîhanê ji mirovên “Neanderthal” û ew yeka dide xuya cîhan mêzeyê Kurdistanê dike û divê gelek bi girîngiyê ve mêzeyî vê yekê bikin û ji vê derfetê bi başî mifahê jê vergirin.

# Binpêkariyên mafê mirovî li Kurdistanê

## Binçavkirin û sepandina sizayên giriran li ser xelkê Kurdistanê berdewam e



Sepandina siza û binçavkirina çendîn welatiyan li bajarê Pîranşar, Melekan û herwisa li bajarê Serdeştê ji aliyê hêzên ewlehiyê ye rêjîmê ve.

Pêka rapora “Kolbernews”ê “Zanko Îranzade”yê temen 32 salî û “Omer Şerîfpûr” ê temen 23 salî yên xelkê gundê “Qelareş”ê ser bi bajarê Serdeştê û herwisa “Ferengîs Fethî û keça wê ya bi navê Ekrem Koxiyan” ên xelkê şehreka Welîesir a bajarê Melekanê ji aliyê hêzên hov ên ewlehî yên rêjîma Îranê ve hatine binçavkirin û bo cihên nexuya veguhastine.
Heta belavbûna vê nûçeyê ti zanyariyek li derheq sedema binçavkirin, tohmetên sepandî û cihê ragirtina wan, ti zanyariyek li ber dest nîne.

Pêka rapora “Hengaw”ê, dadgeha rêjîmê li bajarê Pîranşarê, bi ser hev 16 sal heps, bi ser 4 welatiyên xelkêwî bajarî de bi wî awayî sepandiye: “Osman Dilsoz” ê temen 66 salî, 2 sal girtîhgeh, “Solêyman Salik” ê temen 73 salî, 10 sal girtîgeh, “Hejar Dilsoz(Ebdulrehîm)” ê temen 30 salî 2 sal girtîgeh û “Akam Xizirzade” yê temen 30 salî, 2 sal girtîgeh”.

Pêka vê raporê ew 4 welatiyên xelkê bajarê Pîranşarê bi tohmeta “endametî li yêk ji hizbên Kurd” hatine binçavkirin.

## Givaşa rêjîma Îranê li ser bawirmendên ola Behayî berdewam e



Rêjîma Îranê 75 sal girtîgeh û 750 milyon Tumen sezaya nexdî bi ser 15 jinên bawirmend ên ola Behayî li bajarê Îsfehanê de sepand.

Taya 1 a dadgeha inqilab a rêjîmê li bajarê Îsfehanê de ser hev 75 sal girtîgeh û 750 milyon Tumen sezaya nexdî û qedexeya derketin ji Îranê û bêparkirinên civakî, bi ser 15 jinên bawirmend ên ola Behayî li bajarê Îsfehanê de sepand.

Pêka rapora Navenda Mafê Mirovî ya Îranê, “Mojgan Pûrşefi`î Erdistanî, Nesrîn Xadimî Qehquruxî, Azîta Rizwanîxwah, Şo`ilê Aşûrî, Mojdê Behamîn, Beşrî Motehher, Sara Şekîb, Semîra Şekîb, Roya Azadxoş, Nûşîn Himmet, Şûrengîz Behamîn, Sanaz Rastê, Meryem Xursendî, Fîrûzê Rastînijad û Ferxunde Rizwanpêy” ji aliyê rêjîmê ve hatine sezadan.

Rêjîma Îranê givaşeke zêde xistiye ser bawirmendên ola Behayî û dest biser darayiyên wan de digre û wan ji cihên jiyana wan de rastî pirsgirêkên micid dike û heta çendin gundên cihên jiyana wan kawil kirine û bi hovanetirîn şêwazê reftarê digel wan dike û wan binçav dike ‘ sezayên giran bi ser wan de disepîne, bi taybet jinên bawirmendê Ola Behayî rastî pirsgirên gelek micid tên.

## Pêla bidarvekirinan ji aliyê rêjîma Îranê ve berdewam e



Rêjîma Îranê li bajarê Selmasê 3 kes , li bajarê Urmiyê 3 kes, li bajarê Erdebêlê 2 ke, li bajarê Miyandavê yek kes û li bajarê Îsfehanê yek kes li rojekê de bidarvekirin.
Pêka raporên belavbûyî li sibêdeha roja Şemî 29ê Banemerê, rêjîma Îranê li bajarê Urmiyê de 3 welatiyên Kurd ên bi navên “Yûsif Seîdî” yê temen 32 salî yê xelkê gundê “Dobire”yê ser bi devera Tirgewer, “Ramîn Lewendpûr” ê temen 27 salî yê xelkê gundê “Xeregoşê” ser bi devera Somayê û Perwîz Qasimî yê temen 35 salî xelkê Gundê Zindeştê ser bi devera Selmasê, li girtîgeha navendî ya rêjîmê li bajarê Urmiyê de bidar vekirin.
Herwisa rêjîma Îranê li bajarê Selmasê de jî li vê rojê de 3 welatiyên din ên Kurd bidar vekirine ku nasnameya wan wiha ye: “Esqer Hacîzade”, “Kawe Başanger” ê xelkê bajarê Mihabadê û kesê din nasnameya wî nehatiye zanîn.
Hertwisa rêjîma Îranê li bajarê Erdebêlê de 2 hevwelatiyên Turk ên bi navên “Ferdîn Mûsazade û Mêhdî Xadim” ên xelkê bajarê Mişkînşehrê, li girtîgeha rêjîmê li bajarê Ewre-debêlê de bidarvekirine.

Herwisa li bajarê Miyandavê de jî ciwanekî Kurd ê temen 21 salî yê bi navê “Ramîn Seadet” ê xelkê gundê “Şamat”ê ser bi bajarê Miyandavê, ku li dema binçavkirinê de zarokekî temen 17 salî bû, ji aliyê rêjîma Îranê ve li girtîgeha rêjîmê li bajarê Miyandavê,hate bidarvekirin.
Herwisa li girtîgeha “Destgird” a rêjîmê li bajarê Îsfehanê de hevwelatiyek ê bi navê “Yasir Ebdullahî” jî li vê rojê de ji aliyê rêjîêma dije mirov a Îranê ve hatiye bidarvekirin.

# Agirî

◆ Rojnameya “Agirî” di van malperên jêrên de bixwînin:
◆ www.Kurdistanmedia.com
◆ www.Agirimedia.org
◆ rojnamaagiri@gmail.com
◆ www.facebook.com/Agirikirmanji

Navnîşana derveyî welat: AFKB.P. 102- 75623 ParisCEDEX 13 –FRANCE E - Mail: Agiri2003@gmail.com Hejmar (470)